

Rêbera Serlêdana Piştgiriya Bernameya Fikra Sivîl ya Yekitiya Ewrûpayê

Naverok

1. Derbarê Bernameyê de	2
2. Kî dikarin serî lê bide?	3
3. Agahiyên hewcedar yên Beriya Serlêdanê	3
4. Kategoriyên piştgiriya yên Fikra Sivîl	5
4.1 Piştgiriya Civîn/Çalakiyan	5
4.2 Piştgiriya Komelvanîyê	6
4.3 Piştgiriya Bizavdarî û Girêdana Toran	7
4.4 Piştgiriya Kampanya û Parêzvanîyê	8
4.5 Piştgiriya Ragihandinê	9
5. Piştgiriya Pisporfî	10
6. Tevger û Qadên Xebatê yên Herêmên Xwedî Kotayên Taybet	10
7. Amrazên Serlêdanê	13
7.1. Pergala Agahiyan ya Fikra Sivîl	13
7.2 Kursiya Alîkariyê ya Fikra Sivîl	14
8. Serlêdan	14
9. Kontrola Guncaviyê	14
10. Agahiyên Ragihandinê	15

1. Derbarê Bernameyê de

Bernameya Fikra Sivîl ya Yekitiya Ewrûpayê, di sala 2012'an de, ji aliyê delegasyona Tirkîyeyê ya Yekitiya Ewrûpayê ve bi armanca piştewaniya xebatên heq-bingeh yê aktîvist û Saziyên Civaka Sivîl (RCS) yê li Tirkîyeyê hate destpêkirin. Di bin banê Fikra Sivîl de, ji nav çendîn mekanîzmayên piştgiriye, bernameya ku piştgiriya aktîvist û tevgeran dike, wekî "Bernamaye Aktîvîstan" dihate zanîn. Piştî dawîlêanîna mekanîzmayên din, îro, Bernameya Aktîvîstan tekane piştgirî ye ku di bin banê Fikra Sivîl de berdewam e.

Fikra Sivîl, bo aktîvist û saziyên civaka sivîl yê ku li qad û herêmên xwe çalak in, bi armanca piştgiriyeberfireh û reformîst hatiye sêwirandin. Armanca sereke ya Fikra Sivîl, bihêzkirina nîrx û bingeha demokrasîyê ya zorîne ye û ji ber vê yekê jî bo nîrxên demokratîk, yeksaniya fîrset û zelaliyê vekirî ye bo hemû xebatan.

Serdema ewil ya bernameyê (peymanî xizmetê), 22'ê Çiriya Pêşîna 2012'an wekî 48 mehan dest pê kir. Serdema duyem 1'ê Adara 2016'an dest pê kir (li gel dirêjkirina 3 mehan) û 27 mehan dewam kir. Serdema sêyê jî, li gorî nîrxandina dawî ya dewra berî xwe û hevdîtina li gel paydarên têkildar hate pêşvebirin. Niha, serdema sêyan dewam dike (1'ê Hezîrana 2018 - 29'ê Sibata 2020) û bêyî ku ev wext bête dirêjkin, li hêviyê ne ku dawî lê bêtin.

Boçûna heq-bingeh, di çarçoveyeka berfireh de tê pênasekirin. Ev, hem heq û serbestiyên însanan yê bingehîn -sosyal, ekonomîk û kulturî û hem jî heqên siruşt û heywanan diparêze. Xebata heq-bingeh, ji çalakiyên parêzvanî û lobiya mijareke ku hêştayê wekî heq nehatiye qebûldîtîna bigire heta ji bo kesên mehrûm ji heqekî rewşa wan pêkanîna planeka acîl, ji hemû helwest û xebatên bo geşkirina qadên heqan pêk tê. Fikra Sivîl, bi boçûna heq-bingehê piştgiriya xebat û/yan jî aktîvist/saziyên civaka sivîl dike.

Bernameya Fikra Sivîl û armancên sereke yê piştgiriya wan ev in:

- Piştewaniya çalakiyên heq-bingeh yê aktîvist û RCS'yan,
- Bihêzkirina şiyarên çavdêrî û parêzvaniya aktîvist û RCS'yan,
- Di navbera aktîvist û RCS'yên li Tirkîyeyê, yan Tirkîye û Yekitiya Ewrûpayê, welatên endam û berendam yê Yekitiya Ewrûpayê (YE) û Navbeynkara Têkiliyên Ewrûpayê (ENPI)¹ girêdana toran û peşvebirina xebatên hevkarîyê,
- Zêdekirina kapasîteyên pêşvebirina çavkanî û komelvaniya RCS'yan,
- Bihêzkirina kapasîteyên zêdekirina haydarî û ragihandina RCS û aktîvîstan.

¹**Welatên Endam:** Elmanya, Awustîrya, Qraliyeta Yekgirtî, Belçîka, Bulgarîstan, Çekya, Danîmarka, Estonya, Finlandiya, Fransa, Xîrvatîstan, Hollanda, Îrlanda, Îspanya, Îtalya, Qîbrîs, Letonya, Luksemburg, Macarîstan, Malta, Polonya, Portekîz, Romanya, Slovakya, Slovenya, Yunanîstan.

Welatên Berendam: Arnavutluk, Bosna Hersek, Karadağ, Kosova, Makedonya, Sîrbistan.

Welatmên ENPI'yê: Azerbaycan, Belarus, Cezayir, Ermenîstan, Fas, Herêma Otorîteya Filistinê, Gürcîstan, Îsrail, İsviçre, İzlanda, Libya, Lübnan, Mısır, Moldova, Norveç, Suriye, Tunus, Ukrayna, Ürdün.

Herêma Ekonomiyê ya Ewrûpayê (EEA): İzlanda, Lihtenştayn, Norveç.

Bazara hevpar Ewrûpayê: İsviçre.

2. Kî dikarin serî lê bidin?²

Fikra Sivil, ji bo piştewaniya tevger û kesên niştecîhê Tirkiyeyê û kesên li jêr -ku faydeyekê li qada sivil ya li Tirkiyeyê bike, hatiye pêşvebirin. Hêvî û bendewarî ew e ku ew tevger û kesên li welatên endam û berendam yê YE û ENPI'yê çalakiyan pêk tînin û xebatên xwe ji bo tevkariya qada sivil ya li Tirkiyeyê pêşkêş dikin û li gel tevger û kesên li Tirkiyeyê çalakiyan pêk tînin, tevkariyê bikin û serlêdan ji terefê şîrkên li Tirkiyeyê ve pêk bê.

- Aktîvist³
- Saziyên Civaka Sivil
 - Komele
 - Weqf
 - Kooperatîfên bêqezenc (non-profit)
 - Platform û torên civaka sivil
 - Însiyatîfên sivil
 - Konseyên bajaran⁴
 - Sendîka
 - Şîrketên ku doza qezencê nakin
 - Komîsyonên baroyan yê di qadên heq de xebatê dikin
 - Navend/yekîneyên civaka sivil yan jî kesên di qadên heq ên zanîngehan de dixebitin⁵

3. Agahiyên hewcedar yê Beriya Serlêdanê

- Fikra Sivil bernameyeka hîbeyê nîne, navbênkariya parêzvaniya mal û milkê Fikra Sivil dike. Ji ber hindê piştgirî ne bi neqdî, lê bi navbênkariyê pêk tê.
- Razandina her qelema ku di çerçoveya budçeyê de tê telebkirin ji layê Fikra Sivil ve bi peydararan tê pêkanîn. Planên lojîstîk yê ku di çerçoveya xebatê de dê bîna pêkanîn, li gorî pêşniyar û tercîhên serlêder ji layê ekîba alîkar ya teknîk ve tê kirin. Fikra Sivil di vê babetê de roleka piştgirî û hêsanker dileyze û bo pêkîner/terefên sêyem pareyan radizînin.
- Serlêdan li gorî rêza daxwazê tîna qebûlkirin. Serlêdan li gorî rêza tarîxa serlêdanê tîna qebûlkirin û di kontrola guncaviyê re derbas dibin û gorî heman rêzê piştgiriya serlêdanên guncav tê kirin.

² Daxwazên alîkariya aynî ku di çerçoveya Fikra Sivil de pêk tînin, dê wekî "serlêdan" bê qebûlkirin.

³Aktîvist: Kesên çalak ên di qirarên muhîm ên civakî de wekî beşdar û xwebexş çalakiyan pêk tînin, ji aliyê yeksanî, beşdarbûn, çiyawazî û rêgezên 'edaletê ve polîtîka û pratîkên cewawerê û faliyetên civaka sivil pirsyar diken.

⁴Konseyên bajaran ên pêkhateyên hiqûqî yê serbixwe ku di bin banê şaredariyan de hatine avakirin, di nav aktorên siyasî de ne -ku heqê wan heye serî li bernameyê bidin.

⁵Serlêdanên navend/yekîneyan yê civakên sivil û heqên însanan yê zanîngehan bi şertê ku faydeyekê li civakên sivil yê Tirkiyeyê bikin dê guncav be.)

- Hindî ku çavkanî têrê kirin û Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ji kapasîteya tetbîqkirinê derbas nebû, serlêdanên Fikra Sivîl daîmî vekiriye bo serlêderan.
- Xebatên ku piştgiriya wan hatî kirin, herwiha dê agahdarî bêne dayîn derheqê tetbîqkirinê de. Beriya serlêdanê, eger hûn proseyên tetbîqkirinê lêkolîn bikin dê faydeyê bidete daxwaza piştgiriya we. Hûn dikarin li ser vê lînkê xwe bigehînine Rêberên Tetbîqkirinê: <http://sivildusun.net/destekler/>
- Ji bo her kategoriyê yekûna piştgiriya herî zêde **5.000 Euro** ye.
- Di serdema 2018-2020an de her serlêder çendîn caran û ji bo çendîn kategoriyê dikare serî li bernameyê bide, belam herî zêde dikare **10.000 Euro** piştgiriya wergire.
- Fikra Sivîl, li gorî ihtiyacê, dikare heman yekûna piştgiriya ji 25 % zêde bike.⁶
- Serlêdanên akademîk, ticarî, faliyetên siyasî, xebatên qezencê û bursên xwendekaran bo serlêdanê guncav nînin.
- Encamên xebatê nabe ku berhemên berjewendîya şexsî yan jî siyasî bin.
- RCS'yên ku statûya wan ya hiqûqî heye, di çarçoveya piştgiriya xebatan de fîlm, kitêb û materyalên din ên çapkirî/dîtbarî, bi armanca duristkirina çavkaniyan dikarin van berhemên bifiroşin.

⁶Bi ser yekûna maksîmûm ya alîkariyê 5000 Euro'yan û %25 zêdebûnê ve, di hin rewşên taybet de (Pêdîviyên li gor guherîna rewşa polîtîk zêde dibin, ji bo ku xebat bi temamî bigihije armanca xwe lêçûnên zêdetir û hwd...), aktivîst û RSC ku sedemên xwe diyar bikin û daxwazekê bikin, ev çend ji layê Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ve tê nirxandin.

4. Kategoriyên Piştgiriye yê Fikra Sivîl

Piştgiriye Fikra Sivîl di bin pênc kategoriyan de dabeş dibin:

1. Piştgiriya Çalakî/Civînan
2. Piştgiriya Komelvanîyê
3. Piştgiriya Bizavdarî û Girêdana Toran
4. Piştgiriya Kampanya û Parêzvanîyê
5. Piştgiriya Ragihandinê

4.1. Piştgiriya Çalakî/Civînan

Piştgiriya Çalakî/Civînan, bo aktîvîst û RCS'yan bi armanca parêzvanî, girêdana toran, hevkarî û faliyetên bihêzkirinê hatiye sêwirandin. Herwiha ev piştgirî li ser babetên girêdana toran, çalakiyên perwerde û parêzvanîyê; civîn, konferans, atolyeyên perwerdehiyê, semîner û hwd. pêk tîne ku di çarçoveya vê piştgiriye de ne.

Ev kategoriya piştgiriye bo serlêdanên aktîvîst û RCS'yan vekiriye.

Piştgiriya Çalakî/Civînan ji van piştgiriyan aynî pêk tê:

- Kirêkirina mekanan
- Xwarin û îkram
- Derfetên çûn-hatinê
- Hêwirîn⁷
- Mesrefên çûn-hatinê⁸
- Qirtasiye⁹
- Wegera nivîskî¹⁰
- Wegera devkî (simultane yan jî paşhatî)
- Kirêkirina Ekîpmanan¹¹
- Sêwiradina materyalên xuyabûnê
- Redaksiyona materyalên xuyabûnê
- Çapkirina materyalên xuyabûnê
- Belavkirina materyalên xuyabûnê
- Piştgiriya pisporan¹²

⁷Qelesa Hêwirînê, bi tenê ji mesrefên ode û taştêyê pêk tê, danên firavîn û şivê tê de nînin.)

⁸ Mesrefên çûn-hatinê li Tirkiyeyê 20 Euro, li derveyî Tirkiyeyê 40 Euro ye.

⁹ Qelesa qirtasiyeyê, ji hewcedariyên di dema civînê de pêk tê. Bo nimûne: Karta berstûkê, kaxiz, pênuş, poster, pênuşa depî hwd.)

¹⁰ Qelesa wegera nivîskî, ji wegera broşûr, raportên tê bêne bikaranîn/bilavkirin pêk tê.)

¹¹ Kirrîna ekîpmanê ne qelemeka guncav ya piştgiriye y e. Kirêkirina ekîpmanê divê ji fiyeta kirrîna ekîpmanê zêdetir nebe û ji 3/1ê fiyete be heqê kirêkirinê.)

4.2. Piştgiriya Komelvaniyê

Piştgiriya Komelvaniyê, ku bi taybet ji bo piştgiriya xebatên bihêzkirina kapasîteya komên berasteng û tevgerên niştecih hatiye sêwirandin, di nav yekîne/navend/ şaxên RCS'yan de, li gel bihêzkirina koordînasyon û plansaziye, bihêzkirina tetbîqkirina kapasîteya RCS'yan ya navxweyî jî daxil e.

Ev kategoriya piştgitiyê bi tenê bo RCS'yan vekiriye. Serlêdanên aktîvîstan bo vê kategoriye dê neyêne qebûlkin.

Piştgiriya Komelvaniyê, ji van piştgiriyan aynî û şewirmendiyê pêk tên:

- Kirêkirina Mekan
- Xwarin û îkram
- Derfetên çûn-hatinê
- Hêwirîn¹³
- Mesrefên çûn-hatinê¹⁴
- Wergera nivîskî
- Wergera devkî (sîmultane û paşhatî)
- Mesrefên îdarî û kirêya ofîsê¹⁵ (kirêya ofîsê û internet, telefona ofîsê, av, ceyran, sotemenî, mehaneya ofîsê)
- Piştgiriya pisporan¹⁶

*Nîşe: Tevgerên ku dê mesrefên wan ên îdarî û kirêya ofîsa wan bêne kêşan, divê pîlana pêşkêşiya teqwîmeka faliyetan di maweya piştgiriye de, sazkirina belgeyeka pîlanê ya stratejîk û dewambariya finansal bikin. Ji ber hindê, di qadên pêkanîna dewambariya tevgerî, teqwîma faliyetan û sazkirina pîlana stratejîk, pêşvebirina çavkaniyan, rêvebiriya paydar û pêşvebirina polîtîkayên xwebexş de, tê pêşniyazkirin ku RCS'yên ku muhtacê piştgiriye ne, ji Hewzeya Pisporan ya Fikra Sivîl daxwaza piştgiriya pisporan bikin. **Di nav RCS'yên de, ku dê daxwaza mesrefên îdarî û kirêya ofîsê bikin, dê dora pêşiyê bo wan tevgeran be ku berî niha ji Fikra Sivîl yan jî ji projeyeka dîtir fon/hîbeya kirê newergirtî û projeyeka mezin rêvenebirî.**

¹²Ji bo çalakîyên curbicur yê bihêzkirina qada civaka sivîl, alîkariya pisporî temsîl dike ku ji Hewza Pisporan ya Fikra Sivîl tê pêkanîn. (Bo nimûne: Hêsaner, perwerdehiya bo qadên cuda cuda, hwd.) Budçeya alîkariya pisporî ne daxilî yekûna alîkariya maxsîmûm ya 5000 Euro'yê ye û hemû mesref ji layê Fikra Sivîl ve tên razandin.

¹³Qeleta hêwirînê bi tenê mesrefên ode û taştêyî dikêşe, xwarina danên firavîn û taştê ne tê ne.)

¹⁴Mesrefên rojane yê çûn-hatinê li Tirkiyeyê 20 Euro, li derveyî Tirkiyeyê 40 Euro ye.)

¹⁵Di bin vê qelemê de, bo komîsyonan depozîto, vekirin û girtina fatûreyan û bedelên muhtemel yê cezayê guncav nîne.

¹⁶Ji bo bihêzkirina kapasîteya faliyetên curbicur ên qada civaka sivîl, tê maneya piştgiriya pisporan ya ji Hewzeya Pisporan ya Fikra Sivîl. (Bo nimûne: Şewirmendiya heq-bingeh, plansaziya stratejîk, rêveberiya dildarî, pêşvebirina çavkaniyan, pêşvebirina stratejîyên ragihandinê, ji bo qadên bi vî rengî perwedeka. parêzvanî, girêdana toran, hwd.) Budçeya Piştgiriya Pisporan, ne daxilî budçeya serekî ya 5.000 Euro'yî ye û hemû mesrefên pisporan ji layê Fikra Sivîl ve tên razandin.

4.3. Piştgiriya Bizavdarî û Girêdana Toran

Ev kategoriya piştgiriye ji bo meseleyên heq-bingeh yê di navbera Tirkîye, welatên endam û berendam yê YA û welatên ENPI'yê de, bi xebatên girêdana toran û girêdana torên netewî yê di nav sînorên Tirkîyeyê de, pêkanîna serlêdana xebatan, lêkolîna nimûneyên baş li cihê wê, xebatên fêrbûnê yê muşterek û faliyetên beşdarbûnê yê çalakiyan, hatiye sêwirandin.

*Ev kategoriya piştgiriye bo serlêdanên **aktivîst** û **RCS**'yan vekirîye.*

Piştgiriya Bizavdarî û Girêdana Toran ji van piştgiriyan aynî pêk tê:

- Çûn-hatina nav-welat û der-welat
- Hêwirîn¹⁷
- Mesrefên çûn-hatinê¹⁸
- Heqê beşdarbûna çalakiyan
- Heqê endamî yê toran
- Heqê pasaportan¹⁹
- Heqê vîzeyê²⁰
- Sîgorteya seferê
- Pula xercê ya derkeftina der-welatî
- Wergera devkî (wergera paşhatî)²¹
- Wergera nivîskî
- Piştgiriya pisporan²²

¹⁷Qelesa hêwirînê bi tenê mesrefên ode û taştêyî dikêşe, xwarina danên firavîn û taştê ne tê ne.

¹⁸ Mesrefên rojane yê çûn-hatinê li Tirkîyeyê 20 Euro, li derveyî Tirkîyeyê 40 Euro ye.

¹⁹ Di çarçoveya bernameyê de mesrefên bordo-pasaportê bo salekê tên kêşan.

²⁰ Berpirsariyên karûbarê vîzeyê aidî kesê/a serlêder e. Ekîba Piştgiriya Teknik ya Fikra Sivil bi tenê heqê vîzeyê li serlêderan vedigerîne.

²¹Di çarçoveya piştgiriya Bizavdarî û Girêdana Toran de, gava ihtiyac bi wergera paşhatî çêbû, tê hêvîkirin ku serlêder li gel wergêrên xwebexş bixebitin. Mesrefên wergêrên xwebexş ên sefer, hêwirîn û hdw. dikare ji Fikra Sivil bêne daxwazkirin.

²²Ji bo bihêzkirina kapasîteya faliyetên curbecur ên qada civaka sivil, tê maneya piştgiriya pisporan ku ji Hewzeya Pisporan ya Fikra Sivil razandin (Bo nimûne: Şewirmendiya heq-bingeh, parêzvani, girêdana toran, hwd.) Budçeya Piştgiriya Pisporan, ne daxilî budçeya serekî ya 5.000 Euro'yî ye û hemû mesrefên pisporan ji layê Fikra Sivil ve tên razandin.

4.4. Piştgiriya Kampanya û Parêzvanîyê

Ev kategoriya piştgiriye ji bo sazkerin û rêvebirina kampanyaya xebatên parêzvanîya babetên heq-bingeh yê aktîvist û RCSyan û bo piştgiriya bihêzkerina materyalan bi dîtbarî, hate sêwirandin.

*Ev kategoriya piştgiriye bo serlêdanên **aktîvist** û **RCS**'yan vekirîye.*

Piştgiriya Kampanya û Parêzvanîyê ji van piştgiriyan aynî pêk tê:

- Sêwirandin, nivîsbarî û rêvebirina malpera Web'ê
- Mesrefên endamîyê û yê kirrîna amrazên dijîtal²³
- Rêveberî û sêwirandina amrazên medyaya civakî
- Navê qadê û mazûvanîyê
- Reklam û îlan
- Sêwirandina materyalên xuyabûnê
- Redaksiyona materyalên xuyabûnê
- Çapkirina materyalên xuyabûnê
- Belavkirina materyalên xuyabûnê
- Mesrefên vîdeoyê yê produksiyon û post-produksiyonê
- Kirêkirina ekîpmanan²⁴
- Wergera nivîskî
- Mesrefên çûn-hatinê
- Hêwirîn²⁵
- Mesrefên çûn-hatinê²⁶
- Piştgiriya pisporan²⁷

²³ Database, depokirin, bernameya sêwirandin û rêvebirina projeyê hwd.

²⁴ Kirrîna ekîpmanan ne qelemeka guncav ya piştgiriye ye. Kirêkirina ekîpmanê divê ji fiyeta kirrîna ekîpmanê zêdetir nebe û ji 3/1ê fiyete be heqê kirêkirinê.)

²⁵ Qelesa hêwirinê bi tenê mesrefên ode û taştêyê dikêşe, xwarina danên firavîn û taştê ne tê ne.)

²⁶ Mesrefên rojane yê çûn-hatinê li Tirkiyeyê 20 Euro, li derveyê Tirkiyeyê 40 Euro ye.)

²⁷ Tê maneya piştgiriya pisporan ji Hewzeya Pisporan ya Fikra Sivîl(bo nimûne: lidarxistina kampanyayan, rêveberîya naverokê, piştgiriya hiqûqî, piştgiriya psîkososyal, dozvekirina stratejîk hwd.) Budçeya Piştgiriya Pisporan, ne daxilî budçeya serekî ya 5.000 Euro'yê ye û hemû mesrefên pisporan ji layê Fikra Sivîl ve tên kêşan.

4.5. Piştgiriya Ragihandinê

Ev kategoriye piştgiriye, di çarçoveya xebatên aktîvist û RCS'yan de hem ji bo avakirina huwîyetê hem jî –bi taybet- bilindkirina xuyabûna tevgerên niştecih hatiye sêwirandin.

*Ev kategoriya piştgiriye bo serlêdanên **aktîvist** û **RCS'yan** vekiriye.*

Piştgiriya Ragihandinê ji van piştgiriyan aynî pêk tê:

- Sêwirandin, nivîsbarî û rêvebirina malpera Web'ê²⁸
- Mesrefên endamtî û kîrîna amrazên dijîtal²⁹
- Rêvebirin û sêwirandina amrazên medyaya civakî
- Mesrefên mazûvaniyê û navê qadê
- Mesrefên reklam û îlanan
- Sêwirandina materyalê xuyabûnê
- Redaksiyona materyalên xuyabûnê
- Çapkirina materyalên xuyabûnê
- Bilavkirina materyalên xuyabûnê
- Mesrefên produksiyon û post-produksiyonê
- Kirêkirina ekîpmanan³⁰
- Wergera nivîskî
- Piştgiriya pisporan³¹

²⁸ RCS'yên ku berî niha piştgiriya malpera Webê wergirtî, mesrefên wan ên malpera Web'ê dê guncav nebe.

²⁹ Databas, depokirin, sêwirandin û bernameya rêvebirina bernameyan û hwd.

³⁰ Kîrîna ekîpmanan ne qelemeka guncav ya piştgiriye ye. Kirêkirina ekîpmanê divê ji fiyeta kîrîna ekîpmanê zêdetir nebe û ji 3/1ê fiyete be heqê kirêkirinê.)

³¹ Ji bo bihêzkirina kapasîteya faliyetên curbecur ên qada civaka sivil, tê maneya piştgiriya pisporan ji Hewzeya Pisporan ya Fikra Sivil (Bo nimûne: Perwerdekariya qadên huwîyeta saziyî, sêwirandinê hwd.) Budçeya Piştgiriya Pisporan, ne daxilî budçeya serekî ya 5.000 Euro'yî ye û hemû mesrefên pisporan ji layê Fikra Sivil ve tên kêşan.

5. Piştgiriya Pisporan

- Hewzeyaya Pisporan ya Fikra Sivîl, ji bo bihêzkirina xebatên hewce yê aktîvist û RCS'yan li gel pisporan, hatiye avakirin.
- Aktîvist û RCS, ji Hewzeyaya Pisporan ya Fikra Sivîl dikarin daxwaza **piştgiriya perwerdekarî bo faliyetên bihêzkirina kapasîteyê, pisporiya ragihandinê, moderasyon û hêsankarî bo civîn û çalakiyan, pêkanîna ankêtan û lêkolîna sehayê, şewirmendiya tîbbî û hiqûqî, çavdêrî û nirxandin, analîza tesîrkerî, rêberî û wergêrî** û di qadên din de piştgiriya pisporî, bikin.
- RCS û aktîvistên ku gava serlêdanê dikin, dikarin qelesa piştgiriya pisporan hilibijêrin û beyan bikin ka dê di kîjan qadê de bixebitin û dê çend wextî li gel pisporan kar bikin.
- Di Hewzeyaya Pisporan ya Fikra Sivîl de zêdetirî 300 pispor hene ku piştgiriya xebatên aktîvist û RCS'yan dikin. Gava serlêdanên piştgiriya pisporan ya RCS û aktîvistan hatin qebûl kirin, ji bo diyarkirina wextê guncav Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl pêwendiyê li gel serlêderan datîne û vê proseyê pêkve pîlan dikin.

6. Herêmên xwedî kotayên taybet, qadên wan ên xebatê û rêzistin

Kategoriyên piştgiriya yê di serdema 2018-2020'an ya bernemayê de, bo civînên koman û yê şewirmendiyê yê li gel çendî RCS û aktîvistan hatin saz kirin.

Di çerçoveya Fikra Sivîl de, li gorî ihtiyacên ji encama civînên şewirîna yê civaka sivîl; di serdema 2016-2018an de, herêmên ku ji layê sedeyî û rêjeyî ve kêmtir sûd wergirtî ji piştgiriya Fikra Sivîl, armanca ew e ku dora ewil bo RCS û qadên xebatên wan be li gorî kotayeka diyarkirî.

Li gel nasîna van pêşekiyan, ji bo konseyên bajarên û rêzistinên li qad û herêmên **xebatên heq-bingeh**, bi armanca pêşvebirina kapasîteyên **tevlîbûna aktîf û civaka sivîl, dê perwerdehiya pêşvebirina kapasîteyê bê pêkanîna ku çendî civînên agahdariyê û civaka sivîl û tevkariyê** di nava xwe de di hewîne. **Civînên agahdariyê û perwerdehiyên pêşvebirina kapasîteyê** dê derveyî van bîna îlankirin.

Komên ku dora ewil dê bo wan be ev in:

- Sendîka
- Konseyên bajarên
- Tevgerên herêmî û tevgerên niştecîh ên li herêma Behra Reş.
- Tevger herêmî û tevgerên niştecîh ên herêma Rojhilatê Anatoliyayê

- Tevgerên herêmî û tevgerên niştecih ên ku derbarê mafên bajar, kêmine û çandî de dixebitin.

Di berdewamiya serdema 2018-2020'an de, di çarçoveya piştgiriya Fikra Sivîl de, piştgiriya nêzikî 440 xebatan hatibû pîlankirin. Di nav vê hejmarê de, kotayên ku ji bo komên taybet li jorê hatine diyarkirin (hemû xebatên ku bo piştevaniyê tê pîlankirin) û sernavên perwerdehiyê di tabloya jêr de hatine beyankirin:

Girseya Eleqadar	Naveroka Perwerdehiyê	Hemû Hejmarên Xebatê yê bo Piştgiriya tên Pîlankirin*
Rêxistinên herêmî û rêxistinên niştecih ên li herêma Behra Reş	Boçûna heq-bingeh, civaka sivîl û beşdarbûna aktîf	30
Rêxistinên herêmî û rêxistinên niştecih ên liherêma Rojhilata Anatoliyayê	Boçûna heq-bingeh, civaka sivîl û beşdarbûna aktîf	30
Rêxistinên herêmî û rêxistinên niştecih ên di qadên mafên çandî, mafên kêmineyan û mafên bajar de dixebitin.	Boçûna heq-bingeh, beşdarbûn, kampanya û parêzvanî	45
Konseyan Bajaran	Boçûna heq-bingeh, civaka sivîl, hevkarîya cemawer-civaka sivîl	15
Sendika	Dê bernameya perwerdehiyê neyête lidarxistin.	10
	Tevahî:	130 xebat

* Têmsîlkarên RCS'yan û aktîvistên ku dê serî li sernavên navhatî yê xwedî kotaya taybet, tê pêşniyazkirin ku serlêdanên xwe piştî perwerdehiyê bikin. Hejmarên xebatên ku dê piştgiriya wan bêne kirin, bi reqemên di tabloya jorê de sînkirî nîne.

Herêmên Anatoliyaya Rojhilat û Behra Reş

Di bin vê serenavî de, dê pêşînî bo herêmên Anatoliyaya Rojhilat û Behra Reş be ku kêmîtir piştgiriyê werdigirin ji piştgiriyên Fikra sivil ên wekî rêjeyî û sedeyî. Piştgiriyên herêmî yên Fikra Sivil, ji bo ku tevgerên niştecih, tevgerên herêmî³² ji meydana rekabetê ya asta netewî biparêze û derheqê pêşvebirina boçûna heq-bingeh de wan bihêz bike, di asteka herêmî de piştewaniya xebatên aktîvîstan bike, hatiye sêwirandin. Armanca van piştgiriyên, ji bo xebatên kampanya û parêzvanîya RCS û aktîvîstan, beşdarbûna mekanîzmayên biryargirtinê yên RCS'yan, pêşvebirina hevkarîya li gel civaka sivil û li gel sektora taybet, cemawer û civaka sivil, tor-girêdana li gel RCS'yên li welatên ENPI, welatên endam û berendam yên YE'yê, berzîkirina asta beşerî û civakî ya lokal û herêmî ye.

Heqên Çandî, heqên kêmîneyan û heqê bajarên

Heqên çandî, di belgeyên polîtîk ên Yekîtiya Ewrûpayê û hevpeymanên navdewletî de, di bin banê beşdarbûn, xwe-gihandin û lêzêdekirina jiyana çandî de tê pênasekirin.³³ Li gorî krîterên siyasî yên Kopenhagê armanc, nasîn, parastin û berbelavkirina azadî û heqên çandî yên li Tirkiyeyê ye û bihêzîkirina mewzûata navhatî ye. Di bin vê serenavî de, îfadeya hunerî û heqê weşanê, heqê telîfê yên derbarê berhemên çandî de, hafîzeyê çandî, parastina mîrata çandî, tekoşîna li hember ketimkirinê û bihevrebûna civakî, xebatên derbarê çand û zimanên li ber rîska mirinê, parastin û pêşvebirina çandên muxtelîf (yên wekî ayîn, ziman, hêmayên folklorîk, spor, mitbex, çanda xwarinê³⁴ û hwd.) û destnîşankirina cografîk li ser berhemên çandî, rê-vekirina li ber komên berasteng yan jî komên der-civakî bo gihîştina jiyana sosyal û diyaloga nav-çandî ya netewî û navdewletî hene û dê piştewaniya xebatên bi vî rengî bête kirin.

Konseyan Bajaran³⁵

Di bin vî serenavî de, beşdarbûna aktîf ya mekanîzmayên biryargirtinê, yeksaniya zayendiya civakî, pêşkêşkirina xizmeta yeksan, xwe-gihandina yeksan ya xizmetên cemawerê û çalakîyên hwd. yên di çarçoveya van serenavan de wek daxwazên guncav in, di çarçoveya bernameyê de tîr qebûlîkirin. Fikra Sivil, di çarçoveya van daxwazan de dê piştgiriyê bide wan xebatan ku konseyên bajarên, RCS'yên herêmî tevî proseya biryargirtinê dikin. Li gel vê yekê, daxwazên piştgiriyê yên ku ji layê erkdarên cemawerê ve li ser navê konseyên bajarên tîr kirin, ne guncav in. Xebatkarên cemawerê bi şertê ku aktîvîst bi heqdest yan bê heqdest xwediyê iznê bin dikarin ji piştgiriyên Fikra Sivil îstifade bikin.

³² Ji bo "tevgerên niştecih" û "tevgerên herêmî" hûn dikarin berê xwe bidin Belgenameya Termên Bingehîn.

³³ Ji bo agahiyên berfirehtir yên derbarê pênaseyên mafên çandî de hûn dikarin berê xwe bidin Beyannameya Gerdûnî ya Mafên Mirovan, Hevpeymanî Navneteweyî ya derbarê Mafên Civakî û Sosyal, Ekonomîk, Biryarên Mehkemeya Mafên Mirovan ya Ewrûpayê û Raportên pêveçûnê yên YE'yê

³⁴ Di bin serenavê mitbex û çanda xwarinê de, xebatên ku di bazina parastina cure û pêşketinna domdar de cih nagirin li gel pêşekiyên Fikra Sivil ne dîdi nava hemahengiyê de ne.

³⁵ Ji bo Qanûna bi hejmara 5393an ya Şaredariyan û Rêzîknameya Konseyên Bajarî ya bi hejmara 26313'yan bnr. <http://www.resmigazete.gov.tr/eskiler/2006/10/20061008-5.htm>

Sendika

Di bin vê serenavê de, armanc ew e ku; bi pêşvebirina diyaloga li gel sendikayên cemawerê û sektora taybet Krîterên Kopenhagê bîn tetbîqkirin, mewzûat bê bihêzkirin, pêdiviyên derbarê sendikayan de ku di Raportên Pêşveçûnê yên 2017-2018'ê yên Komîsyona Ewrûpayêde cih digirin, bîn pêkanîn. Di bin serenavê sendikayê de, pêşvebirina politîkayên endamtiyê yên karker, karsaz û sendikayên cemawerê, perwerdekirina civakê ya derbarê rêxistina sendikayê de, kirina vekolînên sektori, kêmkirina îstîhdama derqeydî, zêdekirina ewlehiya cihên karî û xebatkarên, û xebatên tevkariya van armancan dikin, dê bîn piştrastkirin.

7. Amrazên Serlêdanê

Serlêdan bi awayekî aktîf ji Pergala Fikra Sivîl (**mis.sivildusun.net**) tên kirin. Piştî ku serlêdan xilas dibin û digihin ber destê Fikra Sivîl, ji mailên qeydkirî yên serlêderan re ku di Pergala Agahiyê de cih digire, derbarê stendina serlêdana wan agahiyek otomatîk tê şandin.

Ew serlêderên bi ser Pergala Agahiyan re di warê serlêdanê de pirsgirêk jiyane divê alîkariyê ji Yekîneya Alîkariyê ya Fikra Sivîl bistînin, heger pirsgirêk berdewam be divê serlêdanên xwe wekî mail bişînin vê navnîşanê, **basvuru@sivildusun.eu** Ew kesên ne xwediyên amrazên teknîkî û ragihandina înternetê ne yan nikarin kompîterê bi kar bînin, dikarin forma serlêdanê dagirin û bi rêya postayê bo ofîsa Fikra Sivîl bişînin.

7.1 Pergala Agahiyê ya Fikra Sivîl

- Ji bo endamtiya Pergala Agahiyê divê hûn berê xwe bidin navnîşana mis.sivildusun.net û pê li bûtona "Qeydî"yê bikin.
- Ji bo ewlehiya daneyan divê şopînerên endamên Pergala Agahiyê şifreyên xwe sê mehan carekê biguherînin.
- Hemû şopînerên ku daxwaza emdamtiya Pergala Agahiyê dikin, Metna Daxwazê û Geşadanê ya derbarê Daneyên Şexsî yên Fikra Sivîl pesend dikin û qeydkirina agahiyên xwe yên şexsî qebûl dikin. Ev metne eleqedar, di maweya qeydiya Pergala Agahiyê de bi awayekî otomatîk ji pesendkirina şopîneran re tê pêşkêşkirin.
- Ji bo ku alîkariya Pergala Agahiyê û proseya serlêdanê van vîdeoyên alîkar bitikînin. <http://bit.ly/sd-basvuru-videolari>
- Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ji bo nirxandina proseya bernameyê dibe ku bi awayekî birêkûpêk ji serlêderên ku alîkarî setendî yan ne stendî re anketan bişîne. Tevlîbûna we ya van nirxandinan dê piştgiriê bide pîvana bandora bernameyê û pêvebirina wê.

7.2 Yekîneya Alîkariyê ya Fikra Sivîl

- Hemû akatîvîst û temsîlkarên RCS ku daxwaza serlêdana alîkariyên Fikra Sivîl dikin yan jî serlêdanên wan nehatine pesendkirin, dikarin Yekîneya Alîkariyê ya Fikra Sivîl alîkariyê bistînin. Ji bo agahiyên berfirehtir binêrin: Rêbera Yekîneya Alîkariyê
- Hûn dikarin rojên Duşemê, Sêşemê, Çarşemê û Pêncşemê di navbera seetên 09:30-12:30 û 14:00-17:30'an de bi telefonê, ji bo hevdîtina rûbirû randevuyê bistînin, an jî bi rêya maîl, Pergala Agahiyê, amrazên medyaya civakî û malbera web'ê xwe bigehînin me.³⁶

8. Serlêdan

- Serlêdan bi Tirkî, Ingilîzî û Kurdî yan jî dema hewcedarî pê hebe bi zimanên din jî dibe bê kirin.
- Bêyî ku li rêbaza serlêdanê ya hatiye tercîhkirin bê nêrîn, hemû serlêdanên ji layê Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ve hatine stendin li gorî dora dema wan a serlêdanê ji kontrola guncaviyê derbas dibin. **Di çerçoveya Fikra Sivîl de derfeta serlêdana acîl nîne.**
- Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl di hin deman de ku serlêdan zêde ne, ji bo ku hemû aktîvîst û RCS bibin xwedyên heman firsendî, serlêdanên ji layê heman serlêderî ve tên kirin, dibe ku asteng bike.

9. Kontrola Guncaviyê

- Fikra Sivîl ne bernameyeke hîbeyê ye, bernameya tevkariya aynî ye. Ji ber vê çendê ji kontrola serlêdanan de proseyan burokratîk yê bernameyên hîbeyan û prosedûrên nixandîne anayên tedbîqkirin. Serlêdan li gorî krîterên sereke yê Fikra Sivîl (bnr. Belgenameya Têhegên Bingehîn) ji kontrola guncaviyê derbas dibin. Di rewşên hewcedar de ji bo bihêzkirina serlêdanê ji layê Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ve serlêder tên arastekirin.

³⁶ Yardım Masası ile ilgili ayrıntılı bilgi için Sivil Düşün Yardım Masası Rehberi'ne bakınız.

- Kontrola guncaviyê bi du merheleyan pêk tê. Di merheleya ewil de serlêdan li gorî krîterên guncaviyê ji layê pisporên xweser ve tîn kontrolkirin. Di merheleya duyemîn de jî serlêdan ji layê Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ve ji ber budçe, kategorî û bandorê tîn kontrolkirin û encamdan. (Jo bo agahiyên berfirehtir bnr. Forma Kontrola Guncaviyê)
- Di maweya kontrola guncaviyê de Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ji aktîvist û RSC'yan derbarê çalakîyên wan de dibe ku agahî û belgenamêyên zêdetir bixwaze.
- Serlêdan, piştî stendina serlêdanê herî **zêde 45 roj, di rewşên paşvegerandina selêdanê de herî dereng din ava 60 rojan de**³⁷ di Pergala Agahiyê de tîn eşkerekirin. Tê pêşniyazkirin ku serlêder planên xwe li gorî vê proseya bikin.
- **Serlêder dikarin bi rêya Pergala Agahiyê xwe bigehînin encamên nirxandinê.** Heke teleb bikin encama nirxandinê wekî form bi mailê tê şandin. Serlêder derbarê îtiraza encama nirxandinê de xwedî maf e. Ji bo îtirazan hûn dikarin ji bo navnîşana yardimmasasi@sivildusun.eu 'ê mailan bişînin.
- Ew kesên serlêdana wan ji layê Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ve bi daxwaza jinûverastkirinê hatiye paşvegerandin, heke sererastkiriên xwe di nava deh rojan de pêk bînin dora xwe ya serlêdanê wînda nakin û kontrola guncaviyê ya serlêdanan carek din pêk tê.
- Ew aktîvist û RCS'yên serlêdanên wan guncav nehatine qebûlkirin, ji bo ku agahdariya derbarê xebatên xwe de bistînin dikarin xwe bigehînin Yekîneya Alîkariyê ya Fikra Sivîl.
- Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl, bi teqîba aktûel ya kapasîteya sepandinê û budçeya bo bernameyê hatiye veqetandin, di hin rewşên hewcedar de derbarê tevkarî û lîmîtên herî jorê de, di stendina bergîriyan û guherînan (guherîna di lîmîtên budçeyê de, sekinandina daxwazên tevkarî û hwd.) de xwedî maf e. Serlêdanên alîkariyê yê Fikra Sivîl, hindî ku ji kapasîteya sepandinê ya Ekîba Alîkariya Teknîkî derbas nebe û hindî ku çavkaniyên finansî yê heyî xilas nebin heya dawiya bernameyê dê vekirî bin.

10. Agahiyên Ragihandinê

Bernameya Fikra Sivîl ya Yekîtiya Ewrûpayê

Adres: Sivil Düşün Program Ofisi/ Ofisa Bernameya Fikra Sivîl
Barbaros Mah. Güniz Sok. No: 32/9 06700 Çankaya/Ankara
Telefon: 0312 428 05 61-62

³⁷Ekîba Alîkariya Teknîkî ya Fikra Sivîl ji bo agahdarkirina derbarê serlêdanan de di demeke herî kurt de dê xwe bigehîne aktîvist û RSC'yan.



📍 Güniz Sokak No: 32/9 06700 Çankaya Ankara
☎️ +90 312 428 05 61/62
📠 +90 312 428 05 63
✉️ info@sivildusun.eu
🌐 www.sivildusun.net

Fax: 0312 428 05 63

E-posta: info@sivildusun.eu

sivildusun.net

facebook.com/SivilDusun

twitter.com/SivilDusun

instagram.com/sivildusun

Ji bo pêşniyaz û şikayetên xwe hûn dikarin ji navnîşana yardimmasasi@sivildusun.eu re mailan bişînin.

